




Ginosî Û Kartêkirina Wê Li Ser Îslamê

Vekolîna Êkemîn

2-3

Ginosî



Dr. Ferset Mereî

Rehrêşalên Ginosîyê

Di xeberdana li ser Ginosîyê da, ka ji kûve hat? pêdivîyên xwastina dîyarbûna wê çi bûn? dozek heye hêşta li ser astê vekolîna nû ya ekadîmî çareser nebûye, çunko bi diristî jêderê wê yê resen nehatîye naskirin, ko hebûna Ginosîyê ji berî Kirîstîyanîyê bît, xudan diruyên zelal û rêkxistineka pêgehiştîya olî bît. tiştek nêzîkî hevrebûnê li nik vekoleran heye; ko Ginosîyê peywendîyeka mikom bi guncandinê (altelfîqîye) heye(42), ew dîyarda ji karlêkkirina li navbera hizira Hêlînzîmî û bawerî û hizirên rojhelatî; Babilî û Misirî û Farsî (Êranî) û Hindî peydabûy, ewa ji encamê dagîrkirina Girîkî bi serdarîya Eskenderê Mekadonî û hevpeymanên wî cîhana kevna li rojhelatê dîyar bûy. hene dibînin, Ginosî êk ji berhemên guncandinê ye, belê hinên dî dibînin, herdu dîyarde Ginosî û guncandin bi du hêlên yeksan û ji hev nêzîk birêve çûyne, di raportekê da, ko merem pê dîyarkirina çaxê dîyarbûna Ginosîyê ye aşkirabûye, hindek ji vekoleran dibînin, ew berî Kirîstîyanîyê ye, her çende li wî çaxî ew hêşta bi pêgehiştina li her sê çerxên berahîkî yê Kirîstîyanîyê ne gehişt bû(43).

Arastek dî heye dibêjît; Ginosîya Yehodî digel xelekên



wanên Ginosîya Kirîstîyanî peyda bûye, ji berî rêka xweya taybet veket û bi hizir û rêkxistina xwe xuser bibît. xudanên vê arastê nîşan bi hebûna gelek ji deqên li pertokxana Nice' Hemadî, ewên piştbestinê li ser jêderên Tewratî diken diden, belê bêy rengvedana boçûnên Kirîstîyanî bît, ew jî mîna deqê xewna Ademî û deqê ravekirina Şîmê û yên dî(44). di vê biwarê da êk ji vekoleran dibêjît: "Ew deqên Ginosîyên bi me gehîştîn dişîyandaye - bi tevayî- wek dubare dariştin û ravekirina çîrokên serdema kevin bihêne zanîn, keristê Tewratê têda zale, her çende rexnê li ser têgehiştina tîtalîya deqên Tewratî diket, her wesa hin kesatî ji serdema kevin mîna: Nohî û Şîtî û Qaynî û Şîmî, bilindikirîne astê pêsiyên pîroz. ew hemû nîşan bi rîşalên Yehodîbûna van deqan didet, heta çaxê ji behayê xudayê Yehodî ji bo berjwenda xudayê nedîyarê bilind kêr diket û rexnê li rêsayê Tewratî diket û derbrrînê ji helwîstê xweyê reşbînê ji cîhana gîtîkî diket"(45).

Hizirên Ginosîyê di hinavên Yehodîyê da werar kirîne û navê (Kebala yan Kevala) lê dihatîyekirin, Kebala li hemû kinarên cudayên cîhanê mezintirîn Ginosa nihênî ya i bûye, bilez ji Felestînê berev Eskenderîyê belav dibû, bi rêka



feylesofê Yehodî (Fîlon)î, ewê rê ji bo dîyarbûna sosîyantî xweşkirî, têkhelî felsefa Girîkî bûye. wî (=Fîlonî) mezintirîn kartêkirin li ser Yohenayê (xudanê mizgîna çarê- alancîl alrabi') hebû(46). ji alîyek dî ve hene rijdîyê li ser alîyê wê yê Kirîstîyanî dîken, bi girovê wê çendê, ko ew ji karvedana Kirîstîyanîyê di hişa civakî da kirî peydabûye. belê sebarete keristê Tewratê yê li pertokxana Nice' Hemadî aşkira bûy, vekolerek li ser dibêjît: "ev deqên (Yehodî) yên hatîne dîtin bi şêwazek Kirîstîyanî neko bi şêwazê Yehodî digel hijmarek mezin ji deqên Ginosîyên bi arasta berçava Kirîstîyanîne. ev deqên henê li serdemên çerxê duyê, li demê belavbûna Kirîstîyanîya Ginosî hatîne bikarînan, neko ji berî hîngî û ne ji alîyê çî giropek Yehodîya em nas dikeyn ve nehatîne bikarînan".(47) peydabûna kesatyên Tewratî ewên di nav deqên Nice' Hemadî da dîyar dibin, vekolerê navbirî hewl didet ji bo nesk (ashahat) ên berahîkî yên geştinama çêbûnê (sifr altekwîn) anko rêviştê Ademî û rêviştê Nohî bi taybetî bêy neskên dîyên geştinamê vegerînît, bi gorey vê çendê Kirîstîyanîya Ginosî mifa ji evî keristê Tewratî kirîye, dako, di nav rexna xwe ya giştî da ji bo cîhana gîtîk(madî), ko ew çêkirina Şeytanî û Yehweye, derbazkirina boçûnên



xweyên taybet bi hevberkirina li navbera xuda (Dîmîrgê Demerage) çêkerê gerdûnê û xudayê Yehodî (Yehwe) biken.

Belê deqên dî yên gešta afrandinê yên taybet bi babikalkên kinêta Esraîlî(benî Esraîl) ji Îbrahîmî heta Yosfî neçûyne di nav da, çunko ew digel binemayên Ginosîyê hevinagirît(48).

Li beramberî xwandingeha li ser şopa qeşeyên peristgehê diçû, ko wan Ginosî bi dîyardeka dinav çarçûvê Kirîstîyanîyê da peydabûy di hijmartin û ji wê varêbûy dizanîn, gelek, nemaze peykevên xwandingeha Elmanî, dibînin ev Ginosîye yan bi taybetî rîşalên wê, rehên wê ji bo berî Kirîstîyanîyê dizivirin. cudabûnê hindek ji vekoleran paldan, Ginosîy wek dîyardeka olî û hizirî ya araste gehîştî û boçûnên ew peydakirî cuda biken. lewra gotina berî yan piştî Kirîstîyanîyê, ya vekolerî ji bo vî têgehî danay, piştbestinê li ser firehîya wî çarçûvî diket, "erê ew çarçûvekê fireye, ko di şîyandaye rewten berbelavên bi renekî ji rengan bi Ginosî bêne hijmartin di nav xuda bigirît yan çarçûvekî bertenge, ew sîstemên Ginosîyên pêşketî yên peristgehê berhingarîya wan dikir bi xweve digirît"(49). givaştina Ginosîyê di nav çarçûvê bertengê rêberên

peristgehê destînîşankirî da, bi gorey gelek ji vekolerên evro di boçûna xweda dikevît, ji ber ko Ginosî di êk jîngeha civakî da peyda nebûye, her wesa ew heman jîngehe ya Kirîstîyanî têda peydabûy. Ginosî di jîngehên civakî yên cuda da peydabûye. pênevêt rewten wê yên ji hev cuda kartêkirinên xumalîyên hawîrrdor di helgirin. ji ber vê egerê sîstemên wê ji hev cuda dibin, ji bo nimûne doza dualîzimê di sîstemên Ginosî da, sîstemên Ginosîya rojhelatî wek mendayî, maneyî, merkonî û Dîsanî (Dîsanîye), bi kartêkirina dualîzima Magoşî ya Êranî ya xudan rehên Babilî karîger bûye(50).

Her ji destpêkê hevrrkî dinavbera ronahî û tarîyê da, di navbera pakî û cengevazîyê da hebû(51), belê xwandingeha Misirî- Sorî ya Ginosî dibînît; ev dualîzimîye biserdaçûne "feyz" yan jêbûnên ji xudayê havî bixweye berev erdî hatîye xwar. hebûna cîhanê berhemê tiracîdîya esmanî ye, ji ber hindabûna hevguncanê di banî "melecut alsemai" da, ew çarenivîsek hingamîye û mirov têhelbûye û pêdivîye jê qurrtal bibît. di evê da mirov şûn tiblên eflatonîya nûjen dibînît(52).

Her çewa bît, li ser jêderên hizir û rêsayên Ginosîyan jê



peydabûne, cudahî di nav vekolera da heye, (Mêrsîya Êlîyad) hizirdiket, çetine vekolîna li ser rîşalên rewte rewanîyê bi navê Ginosî bikeyn, belê di şîyandaye ji gelek zanînên berê yan hevçerx cuda bibît, ev "arîşe pişkeka jêvenebûye, ji pitirîya olên wî serdemî, Zerdeştî, nihêndar (=olên nihêndar- dîyanat alasar), o Yehodîya Kirîstîyanî, ew zanînên em dê bînîn ko ew ji perwerdeya hindrî (telîma batnîya) pêkdihêt. nêzîkî hemû ewan çîrokên mîtolojiyên li ser piştî mirnê, ewên ji bo nivîserên Ginosîyê bûyne binîyat, yên berî Ginosîyê ne, bi ramanek dirist Strictosensu hendek ji wan li Êrana kevnar û li Hindê ji serdema Obaniçadî ne, li Orfayê (Ruhayê) û Eflatonîyê, hindek ji wan ji corê Hêlînzimî û Cuhîyatîya navbera herdu serdeman (=serdema kevin û nû, anko li navbera Cuhîyatî û Felehîyê) bi hevguncanin"(53).

Belê feylesofê Misirî (Ebdulrehman Bedewî) di nav nîşanpêkirinên xwe da li ser wan qonaxên Eflatonîya nûjen têrra derbazbûy, hewl didet girêdanekê di navbera wê û Ginosîyê da biket, li ser wî binîyatî; ko ya dawîyê kartêkirineka mezin li ser peydabûna Eflatonîya nûjen kirîye, ji ber ko sê pirsên mîna hev di navbera herdu alîyan

da hene: pîrsa êkê, pîrsa (êkane) yan xudayê berz û bilindê nepenî, ewê bi çî renekî ji xudayê afrande (Dîmîrgî) yan xudayê cengevazîyê cuda nabît, di şîyandanîne em hizir bikeyn (êkane) saloxete. o ya duyê pîrsa (jêbûnê-biserdaçûnê =alsdur- alfeyz) ye, sêyemîn û dawî pîrsa mak yan keristey (alhûlî aw almade) ye, bi ankoya ew ji êkaney vepesîye. belê ew di boçûnên xweyên dawîyê da piştbestinê li ser gotinên zana û hizirvanên Ewropî diket, hewl didet bawerîyên Ginosî bi olên rojhelatî wek Zerdeştî û Hindî ve girê bidet, herçend ko (pêştir) tinê ew li ser hizir û rewşenbîrîya Hêlînzimî dihate hijmartin(55).

Saxletên giştî yên Ginosîyê

Di xeberdana li ser saxlet û stûnên bawerîya Ginosîyê jê pêkdihêt da, geleka çetine tiştên mîna yasayên bawerîya Kirîstîyanî yan stûnên rêsayê cuhîyan dinav da bibînî, eger ji bo berbelavîya xwandingehên Ginosîyê û tekezkirina kesatîyên Ginosî li ser azadîya afrandin û derbrînê û nebûna sepandina berbendên dijwar li ser ramandinên lahotî vedigerrît, wekî ko ew ji nav saxletên giştîyên nêrrîna Ginosî ya cîhanê derne kevît. ew hemû bûye egera

peydabûna araste û xwandingehên hizirîyên berbelavên Ginosî yên çî caran di nav çwarçovê bawerîyekê yan peristgehekê (kinîsekê) da nehatîne rêkxistin, eger derbrîna meya dirist bît, ko eger serpeçî li ser bendekê bihête kirin bi serdaçûn û varêbûn ji bawerîya heyî bihête hijmartin.

Belê digel hindê jî vekoler û lêger dikarît wan saxlet û hêlên giştî bibînît, yên dişên pirtên hizira Ginosîyê wek: pêzanî, çêkerî, dualî û qurrtaî yê di jîngehekê da bicivînît(56).

Pêzanî dikevîte di cergê bawerî û peristinên Ginosîyan da, pêzanî bi rêka hizirkirin û fêrkirinê bidestve nahêt, lê belê ew kirîyarek rewanîya hindrîye berev aşkirakirina mercên mirovînî diçît, berev nasîna derûnî diçît, berev nasîna xudayê zîndî hêsdîtin û aşkirakirin û sroşwergirtinê diçît, ev nasîne merce, ko rewana bendikirîya dinav cesteyê madî û cîhana madîya mezintir da azad biket û berev cîhana ronahîya jê peydabûy vegeerît.

ew xudayê Ginosî di nav xwe da lêdgerrît, ne xuda (Yehwe) yê çêkerê vê cîhana madî ya kêma tîj cengevazî ye, belê ew zîndîyek êkaneyê bilinde û ji dualîya afrandinê

(=made û rewan= can û ceste) derbaz dibît, ew nahête saloxdan yan bi navkirin, dişîyanda nîne bihête naskirin, çunko hebûna wî ji derveyî hemû ramanên têgehiştina meye(57).

Belê ev tiştbûne Nothingness bi goreyî derbrrîna (Karîn Ermstrong)î divîya xwe nasîyar biket û ji tinêmana di nav kûrî û bêdengîyê razî nebû, di nav kûranîyên wî yên bê pêgehiştin da hezek hindrî serhlda. ev hebûne ji zincîrek bi serdaçûnan (alfeyz), mîna wan bi serdaçûnên di mîtulogîya dualîzimên kevin da hatî saloxdan peyda bû(58). Ginosî hizirdiken ev cîhana kêma tijî cengevazî ne ji çêkirina xudaye, belê ew ji çêkirina xudavendê kêmtirê pile dûye, (pile dû yan jêçêbûy) ewe, karîna wî ne hindî şîyana xudayê bi dirustîye.

Efsana Ginosîyan dibêjît: xudayê afrandî (jêçêbûy) Demerage kurrê pendê (Sofîya Sophia)yê ye û ew dumahêk jêpeydabûy yan (Yon Enos)ên esmanîye, divîya bê hevpişk ji dayk bibit, belê pend (Sofîya) dikevîte ji dervey miştûnê (Pleroma)ê madey dibt û guharrîyek kirêt û têkhel ji cengevazyê dibt, evê henê dgavêda ji destan derdikevît. belê ev afrandîyê guharrî di ser behayên xwera pişkek ji



ronahîya eqlî heye, deyka wî Sofîayê pêdaye(59).

wêjevanîya Ginosî hizir diket ev afranderê jêpeydabûy her heman xudavendê serdema kevine, beramberî (Engiremaynevî) yê Zerdeştî û paşî Şeytanî ye, wî bi şahê tarîyê bi nav diken û li hawîrr wî hevkarên wî ji hêza tarîyê ne û bi Eragon dihêne binavkirin (Eragon bi zimanê Yonanî ankoya hukimdar "hakim" didet).

Paşî deqên Ginosî bi ravekirina taybeta deqên neska çêbûnê (sfr altekwîn) ya Tewratê rabin û li ser vî xudavendî di sepînin û bi xuda yehwe û bi navê Yalda baoth bi nav diken, û ev nave di (pertoka nihênên îohenay) da heye, ko dibêjît: "Yelda baeosî bi madey girt û hewlda afrandinê biket, li destpêkê Eragon çêkirin, ew şîyanên cengevazin û di kirîyara didwîv ra harîkarîya wî kirin, anko mirovê êkê Adem afrandin"(60). her çende evî xudavendî mirov ji madê erdê tarîyê afrand, lê belê wî canê xwe ji bilindîya dizî wergirt û di kalbendê cesteyî da zîndankir. dako wî di perdeya nezanîne da bihêlît rêsa (şrîet = pêrabûnên rêsayî) li ser sepandin, dako ew bi xweve mijûl bît û gewherê rast û dirustê canî aşkira neket(61).

U sebareet qurrtaibûna Ginosî mizgînê pê diden, ne ew

ew qurrtaibûna cesteyî ye ya olên esmanî û Zerdeştî mizgînê pê diden, ewa mizgînê didet, ko cestên mirîyan roja rabûnê radibineve, qurtalbûna Ginosîyan qurtalbûna canîye, ew qurtalbûna ji cesteyî û canî pêkveve, neko mîna Kirîstîyanî dibêjît ji şaşî û gunehê ye, eger hatu têgehek li ser (şaşîya resen) di bawerîya Ginosîyan da hebît, ew ketina canî di nav cîhana madey daye, eger têgehek li ser tobekirinê hebît, ew hişyarîya mirovî ye ji bo mercê wî yê erdî û lêgerîyana wî ji bo hevgerîna hindabûy, digel vê hişyarîyê can dest bi geştê qurtalbûn û azadbûnê diket û ji dergehî berev gorî yan pira derbazbûnê dihête veguhastin da berev gerreka dî ya kirasgûhorînê biçît, berev dergehê cîhana ronahîya bilindtir birê bikevît. ewê pêzanîyê bidestve bînît, dibît ji berî mirnê vejandinê bibînît, tinê li ser wî ye çaverêbûna mirnê biket, ewa dê kirasê wî yê madî ji berket û wî berev canek azad veguhêzît, eve gotina qurtalker Mesîhî ye di mizgîna (encîla) Toma ya Ginosî da hatîye: "ev esmane namînît, ewê li ser wî jî namînît, belê ewên zîndî ne namirin û ewên mirîne zîndî nabneve"(62).

Bi goreyî rênimayên Ginosî, cudahî di navbera Ginosî û Kirîstîyanên heyî da li ser hêjayê Mesîh hene, ewê bi goreyî



Kirîstîyana qurtalker û xwegorîkere, ew jî ew sîmayên mirovînî li eîsayê mesîh her tinê şeveng bû, çunko wî – bigorey gotina wan – cesteyek asayî bi ramana hestewerîyê nebû. belê sebarex xaçdan û mirnê ew dibêjin yan ew bi hinrek (bilinda xudayî) ji êşana xaçdanê qurtal bûye yan kesek dî li şûna wî hatîye xaçdanê, ew jî Yehodayê esxerîotî yan semeanê qorînî bû(63).

Mirovê (Entirobos) bi rêka qurtalbûnê dikarît berev (xud)ê xudayî (=xudayê bilindê nedîyar) vegeşt, bi şêwazê peyskdarîyê ji madeyî destpêdiket û di zîndîyên candar (eyonan) ra derbaz dibît, paşî bi peyvê (logos)ê yan jî bi ronahîya (eqlî) peydabûy ve dihête girêdan, heta bi xudayê bilind digehît(64).

Jêder û çavkanî û dehmen

٤٢- (التلفيقية: يان التوفيقية)، پێشه‌نان یان گونجاندن Syncretism، ئەو بزافه‌ك گونجاندا نافه‌را باوه‌ریین ئۆلی یین جودا‌جودایه، ئیدی مله‌ت باوه‌ریی ب وان بۆ‌چوونین ژ باب‌کالکان ژیرا ماین نائین، به‌ئێ ژ بۆ‌چوونین مله‌تین دی یین هه‌فچه‌رخ ژ ل سه‌ر زنده‌کرن، میتۆلۆژیا بابلی هه‌تا ده‌قه‌رین دوور ژ چوو، گه‌لین دی ژ په‌سندکرن و هه‌ده‌ک گوه‌رتن ب سه‌رفه‌کرن، ئەو سه‌باره‌ت ستیرناسی و پێشبینی و جادۆفانیا بابلی و باوه‌رداریین ئیرانی (=ماگۆشی -مجوسی- ئەه‌تنی) د چاک و نه‌پاکیی دا و په‌رسنا میتزایی چیبوویی، مینا کۆ په‌رسنن نه‌یینی ل

وهلاتى يونانى - رومانى و گنوسى و فيتاگورسييا نووژهن و فهلسهفا فيلوئى (=فيلون) و نهفلاتونىيا نووژهن (=نهفلوتين) و كريستيانى دياربوون، و نهوا ب سهر يههوديى دا هاتى ژ بهرى يين دى د باوهرين ئولى دا پيگههشتن، د نهفى كهشى هزرى و رهوانيى زيندى دا، كارتيكرنهكا هزرى يا ئافس و حهزا گشتى بهرهف ههفگونجانى د هزرى دا چوو، بهرمايهك مشهرهنگ ژ پهراستن و پيرابوونين رههين وان گهلهك كوور و ب سؤمهرو مسرى دگهه چيپوو. ينظر: بيار كالنيقية: المسيحية في القرن الاول للميلاد، في المسيحية عبر تاريخها في الاشرق، الطبعة الثانية، (بيروت، مجلس كنائس الشرق الاوسط، ٢٠٠٢م) ص ٣٩-٧٥؛ فهكولههرك عهرو ب تهكهزيى ل سهر فى تيگهه دكهت، كو "گنوسى ههولا ههفگونجاندا ل نافهرا كريستيانى و هيلينى يه... داكو دگهل گرؤپين پيشهنگتر د وارى هزرى دا (=نهنتليگنسييا ب تيگهه ههفچهرخ) ب گونجيت". ينظر: نيقولا زياده: المسيحية و العرب، ط٢، (دمشق، قدمس للنشر، ٢٠٠٠م)، ص ٨٦.

٤٣- عزيز سباهي: اصول الصابئة، ص ١٤٧-١٤٨.

٤٤- ههفبهركرنى دگهل نهوا سهمعانى سامرى بكه، ههكو بهگم نهكرى دانپيدانى ب گنوسىيا عيسايى ب تنى (=دياربوونا خودايى دسيسايى دا) بكهت، و گووت دى دياربوونا خودايى د بهيكهفان دا ههتا داوييا دنيايى بهردهوام بيت. نهگهر ژ ئمپراتورين رومانى نهبا، دا كيشا سهمعانى ههموو كريستيانين فهگریت. عبدالمنعم الحفني: موسوعة الفلسفة و الفلاسفة (القاهرة، مكتبة مدبولي، دت)، ج٢، ص ٩٢٥.

٤٥- السواح: الوجه الاخر، ص ٧٥-٨٤، ژ Kart Rodolf, Gnosis, P.277 هاتييه فهگوهاستن.

٤٦- النشار: نشأة الفكر الفلسفي في الاسلام، ج١، ص ١٨٧؛ عبدالمنعم الحفني: موسوعة الفلسفية و الفلاسفة، ج٢، ص ٩٣٥.

٤٧- السواح: الوجه الاخر، ص ٧٥؛ ههفبهركرنى دگهل گووتنا وى يا د پهرتوكا وى يا دى دا ((الرحمن و الشيطان، دمشق دار علماءالدين، ٢٠٠٣م)، ص ٢٠٣-٢٠٦)) دا هاتى بكه، ههكو ههول ددهت گنوسىي ب پهنداداريا هرمسييا تيگهه ل ژ هزرين

ئەفلاتونىيا نووژەن ب مېتۇلۇژىيا مسرى د ميناكىن وئ يېن درەنگ يېن خودان سروشتن نھيىن المستيكي (=سوقن) فە گرى بدەت، و ژ بەر كۆ نامەيىن هرمسى ل سەرى سەدسالائىكى يا بەرى زايىنى هاتنە نقيساندن، ئەفە هەفدزى ئەوا وى د بەرتۇكا خوە (الوجه الاخر للمسيح) دا گۆتتية، ل چاخەكى كۆ هەول ددەت ب هەر ئاوايهكى ب سەپينيت يان ئاماژى بدەت، كۆ گنۇسىي د نافت كريستيانىي دا وەراركرييه و گەش بوويه، فەكۆلەرى رۇسى ئى. ئىس. سقىنيسسكاي د بەرتۇكا خوە (كريستيانى و ئمپراتوريا رۇمانى) دا هەفبيريى دگەل وى دكەت. ينظر: (المسيحيون و الامبراطورية الرومانية)، ترجمة، حسان ميخائيل إسحاق: (دمشق، دار علماءالدين، ۲۰۰۸م)، ص ۱۷۲-۱۸۹.

۴۸- المرجع السابق، ص ۷۵-۷۶، و ل فيره السواح نيشان ب هزر فانهك گنۇسى دكەت، ئەو مامۇستا (باسيليد Basillides)، كۆ دىبىزيت: "ئەم نەمانە يەھۇدى، هيشتا نەبووينە كريستيان ژى". و گۆتتا گرۇپەك ژ بەيكەفېن مامۇستا (فالتناينى Valentin)ى: "هەكۆ ئەم عبرانى بووين ئەم د ئىتيم بووين". هەمان ژيدەر.

۴۹- ب دروستى دياردا مشه نالى و ژ هەفجودابوونى د قادا پيزانييا (گنۇسى) دا دياردەك كەفئارە، دبیت وئ بالا ريبەرىن بەرستگەھى ژ بەيكەفېن (فالتناينى، ژ ئەسكەندەرىي يە و ل سالا ۱۷۷م مرييه) ئەوین بەرھنگارىيا پيزانان دكرن كشاندييه، قەشە ئيرىنى Irenee، قەشى باژيرى ليون، ژ دەستپىكا سالا ۱۷۷م ددەرەھەقا وان دا گۆتتية: "چەتنە تۆ دوو يان سى كەسان د نافت وان دا پەيدا بكى، ل سەر هەمان بابەتى هەمان تىشتى بيژن، ئەو ب شيوەكى رەھا د هەفدزىن، چ ل سەر ئاستى پەيفان بيت يان ل سەر ئاستى تىشتان بيت". الجابري: بنية العقل العربي، ص ۲۵۴ هامش ۱۲، ژ سىرگى هوينى، ژ بەرتۇكا وى گنۇسى، ب زمانى فەرنسى فەگواستىيه.

۵۰- عزيز سباهى: اصول الصابئه، ص ۱۴۸-۱۴۹.

۵۱- گەلەك ژ فەكۆلەرىن ئەورپى و عەرەب ئاماژە پى ددەن، كۆ رەھيىن هزرا دو ئاليزما ئيرانى ژ بو ولاتى ميزۇپۇتامىيا و ب تاييەتى ژ بو ئەفسانين سۆمەرى و بابلى ل دوور هەفركىيا جەنگەفازى ل نافتەرا خودافەندا ژ بو بدەستفە ئينانا

- نهمرنى فهدگهړن. ژ بو پتر پېزانينان، ينظر: فاروق الدمولوجي: تاريخ الأديان، الالهية و تاريخ الالهة، (بيروت، الاهلية للنشر و التوزيع، ٢٠٠٤م)، ص ٢٣٩-٢٥٤.
- ٥٢- ئهفلاتونيا نووژهن (Neo Platonism)، خواندنگه ههك فهلسهفويه، ل داوى روژين نمپراتورييا رومانى ژ چهرخى سى يى ههتا شهشى زايينى گهشهكرييه، كارتىكرن ل سهر هزرا كريستيانى و ميتافيزيكي كرييه، (ئهفلوتين Plotinus) ٢٠٥-٢٠٧ز رژدكر، تيؤرا بسهر داجوونا خوداى بيژيت، ئهوا ئافراندى رافهدكته، كو خودا زيدهرى ههموو ئافراندهيانه و مروف ب تهفافيي (كهمالى) ناگههيت ههتا جانى خوه ژ جهستهي قورتال نهكته و دگهل رهوانا بلند ههفكرتنى نهكته. ئهف ئيكانه يى ب تنى ئهفلى خودايى يه، رهوانا گهردوونى يان گشتى ژى پهيدا بوويه، ئهوا ژ رهوانين پرتى و ههسته وهرين بهرههفى چي بوونى پيكدهيى، ژ بهر كو رهوان خودان دوو چهزكرنه: چهزكرنا بلند پيقهه ندى هزرا خودايى يه، چهزكرنا جيهانى ژ كه رستين گيتيكي (مادى) پيكدهيى. جورج طرابيشي: معجم الفلاسفة، ص ٧٦-٧٧؛ هتشنسون: منجم الافكار و الاعلام، ص ٣٦-٣٧.
- ٥٣- تاريخ المعتقدات والافكار الدينية، ترجمة، عبدالهادي عباس، ج ٢، ص ٤٠٥-٤٠٦.
- ٥٤- خريف الفكر اليوناني، الطبعة الخامسة (كويت، وكالة المطبوعات، ١٩٧٩)، ص ١١٨-١١٩.
- ٥٥- السواح: طريق اخوان الصفا المدخل الى الغنوصية الاسلامية، الطبعة الاولى، (دمشق، دار علاء الدين، ٢٠٠٨م)، ص ٣١٠-٣٢.
- ٥٦- عبدالرحمن بدوي: موسوعة الفلسفة، ج ٢، ص ٨٨-٨٩.
- ٥٧- ب ئهفى خالى نزانم (Agno Stism) ئهوا دبيژيت هه بوونا خودايى و خورستى وى و كنيئا گهردى ئه و تشتن چ ريك ژ بو زانينا وان نينن.
- ٥٨- كارين ارمسترونج: الله و الانسان على امتداد ٢٠٠٠ سنة من ابراهيم الخليل حتى العصر الحاضر، ترجمة، محمد الجورا، (دمشق، دار الحصاد، ١٩٩٦م)، ص ١٠٧.
- ٥٩- مرقص: الغنوصية، ص ٦٥.
- ٦٠- السواح: الوجه الاخر، ص ١٥١؛ مرقص: الغنوصية، ص ٦٦.



٦١- ئەفه بەرامبەری گیۆمەرتی ئۆلین ئیرانییە، ئەوی ل هەقبەری ئادەمی یان مروفی ئیکێ یە. ئەه هزرا گنۆسی ل دۆر نەپیکرنا ب رێسا و پیرابوون و پەرستان، بەرهه گەلهک تییپن کریستیانی و ئیسلامی چوو، چونکۆ ب گۆرهی دەربرینا وی ئەو تشتین کنارینه و تشتهکی ل گەوههری زیدەناکهن.

٦٢- الاناجیل، النصوص الكاملة، ص ٤١٦.

٦٣- W.H.C. Fred, Therise of Chiristianiry, Londonm 1884, P.205؛ عزیز سوریا، عطیة: تاریخ المسيحية الشرقية، ترجمة: إسحاق عبید، (القاهرة، المجلس الاعلی، ٢٠٠٥م) ص ٥٤، دبیت عطیة ب ئالیی راستیی دا چوو، ههکۆ گریدان د نافبەرا قورتالبوونا عیسایی مهسیح ژ خاجدانئ و باوهرییا مهركیان دا کری، و ب نافئ باوهرییا دوکاتی، دوکتی ب نافکری، ب راستی باوهرییا مهركونی تهکهزیی ل سەر کریارا خاجدانا عیسایی مهسیح دکەت، ئەو چاره‌نقیسی رهشی خودایی ل سەردهما کهفنا بوو، ئەو د باوهرییا گنۆسی دا ل بەرامبەری خودایی ئافراندەر دیمیرگی یە. ژ بو پتر زانیاریان ل سەر دوکتییان، ينظر: نهاد خیاطة: الفرق و المذاهب المسيحية منذ البدايات حتي ظهور الإسلام، الطبعة الثانية، (دمشق، دار الأوائل، ٢٠٠٤م)، ص ٧٨-٨١.

٦٤- عبدالرحمن بدوي: التراث اليوناني في الحضارة الإسلامية، الطبعة الرابعة، (الكويت، وكالة المطبوعات، ١٩٨٠م)، ص ٧-٨، هامش "١". هەر ب فئ هه‌لکهفتی روژهلتناسی فه‌رنسی هنری کوربان هه‌ول ددهت هەر دوازده ئیمامین شیعه ب بلیرۆما (=مشتبوونا بانی ب ئەیۆنان =بسه‌رداچوونین خودایی) فه‌ گریبدهت، و ئەفه مه‌ترسیی ل سەر باوه‌رداریا ئیسلامی دروست دکەت. ينظر الشيعة الاثنا عشرية، ترجمة: ذوقان قرقوط، الطبعة الثالثة، (القاهرة، مكتبة مدبولي، ٢٠٠٤م) ص ٧٣-٧٧.

**Amadekirin Û Wergerandin
Kurdo Şikakî**